



*Mistefa Hicrî:
“Di Kurdis-
tana Rojava
de nabe tenê
aliyek biryarê
bide”. ...» 3*

*Pola:
“Min şerekî
qehremanane
kir, lewra navê
min danîn
pola”. ...» 8*



Bidestveanîna mafên netewî yê gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

AGIRÎ

Daxuyaniya Deftera Siyasî ya PDKÎ R:2
Hesen Rûhanî jî, rast negot R:6
Tasa Jehrê û gumanên navikî ên Xamineyî R:7
Tundûtîjiya li hemberî jinan R: 9
Gotûbêja bi hunermend Faroq Soltanî re R:10

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî www.agirimedia.org Hejmar (219) 06-12.2013 Buha (150) Tûmen

Mandêla tu car namire

Mandêla: Hekî hûn xwe di cihê Kurdan de danên, hûnê bizanin min çima xelata Ataturk wernegirt

Serkomarê Afrîqaya Başûr roja 5'ê Desamberê nûçeya koça dawiyê ya Mandêla serkomarê pêşîn ê Afrîqaya Başûr û rêberê tevgera dijî apartaydê, û wergirê xelata Nobêl, bi awayekî fermî ragehand. Mandêla sala 1918'an li Tirsanskay di Başûrê Afrîqayê de hate dinê. Ew di sala 1942'an de ji zanîngeha Fort Hayir hate derkirin, û di sala 1943'an de tevî Kongireya Neteweyî ya Afrîqaya başûr bû, û piştê di sala 1958'an de berpirsayeriya beşa leşkerî ya vê kongireyê girte stûyê xwe. Di sala 1960'î de Mandêla xebateke çekdarî li dijî siyaseta ferq û cudahîdanîna regezî dest pê kir. Navbirî piştê hate girtin û bi tawana îxanetê hukmê girtina heta hetayî bi ser de hate sepandin. Ew piştî 27 salan di 11.02.1990'î de hate azadkirin, û di sala 1993'an de xe-



lata Nobêl wergirt. Di sala 1994'an de bû yekemîn serkomarê çermreş (reşpêst) ê Afrîqaya Başûr û di sala 1999'an de desta ji deshilatê berda, û rê ji bo hevalên xwe xweş kir da ku karûbarên welat birêve bibin. Hêjayî basê ye ku dema ku Turkiyê xwest ku xelata Ataturk bide Mandêla, wî ew xelat wernegirt û di bersiva pirsên nûçegihanên de ragehand ku hekî hûn xwe di cihê Kurdan de danên, wê demê hûnê bizanin ku min çima ew Xelat wernegirt.

Sergotar

Rojava û

Derfeteke dîrokî

Şehab Xalidî

Bê guman derfetên dîrokî, derfetên zêrîn in, û di dîrok de gellek kêman derfeteke wisa ji mirovahiyê re çê dibe, ku bikare armanacên xwe yê ku bi salan çavniherî kiriye, û xwîn di pêxema wan armanacên de rijandiye bi dest bixîne.

Belê îro em di Kurdistanê Rojava de şahidê hebûna derfeteke bi vî rengî ne, ku li derdora vê para rengîn ya xaka Kurdistanê, gurên har û birçî, wate neyarên doza Kurdan, pîlanên qirêj û biyom li dijî Kurdan dadirêjin. Gelo ma li hemberî wan hemû pîlanên de, ne hewce ye ku Kurd bi dûr ji berjewendiyên takekesî û hizbî, di nava hewildanan de bin ku xewnên bi salan yê de û bavên şehîdan, bi dest bixin.

Mixabin ji hemû neyaran zêdetir, eva Kurd bixwe ne ku dijminê wan hez û hêviyên xwe yê bi salan in. Ew in ku bona berjewendiyên xwe yê hizbî û takekesî hawara xwe dibne ber wan aliyên ku hez ji tebahî û avedaniya navmala Kurd nakin.

Lewra asayî ye ku hekî hêz yan rêkxiraw û partiyeke Kurd li ser bingeha berjewendiyên xwe ên demikî, rêveberiyek demkî bi tenê ava bike, û beşeke berçav ya civaka Kurdî di vê para Kurdistanê de pişt guhên xwe ve havêje, zehmet e ku bikare azadî û xwebirêveberiyê qahîm û berdewam di nav vê herêma aloz ya Rojhelata Navîn de pêk bîne.

Lewra daxwaza her Kurdekî welatperwer ew e ku bi yekîtiya xwe û serûberkirina navmala xwe, li ser bingeha berjewendiyên neteweyî deshilateke wisa bi hêz ava bikin, ku neyarên Kurdan jî neçar bin ku riya dostayetiye bi wan re bigirne pêş. Herçend "Rê dibne bihust, lê dijmin nabne dost", lê bihêzbûna Kurdan dikare rojekê neyaran neçar bike ku bi Kurdan re bibne dost, ji ber ku berjewendiyên wan jî rene rojekê di dostatiya bi Kurdan re hebe.

PDKÎ: "Armanca rejîma Îranê ji lihevhatina Cinevê kirîna demê ye".

Kurdistanmedia: Deftera Siyasî ya PDKÎ derheq lihevhatina navikî li Cinevê daxuyaniyek bilav kir. Deqa vê daxuyaniyê bi vî awayî ye:

Piştî zêdetir ji 10 salan gêre û kêşe û guhnedana bi lihevhatinên navneteweyî rejîma Komara Îslamiya Îranê li jêr zext û givaşa siyasî û aborî ya gemaro û cezayên aborî, bi neçarî serî li hember zextên navneteweyî tewand, û di 24'ê Novembara 2013'an de lihevhatinnameyek digel girûpa 5+1 îmze kir. Di vê lihevhatinê de herçend ku bi awayekî demkî hinek poanên aborî ên biçûk wergirtin, lê di hember de destê xwe ji beşeke berçav ji projeya navikî hilgirt, û wekî aliyê dorandî û teslîmbûyî di vê lihevhatinê de derket.

Zêdetir ji 20 salî ye ku Komara Îslamiya Îranê bi awayê veşartî û eşkere projeya xwe ya navikî ber bi pêş ve dibe, û di hewla destpêregihîştina bi çeka navikî de bûye.

Li gorî hinek lêkolînan zêdetir ji 170 milyar dolar ji samana welat di pêxema vê projeyê de hatiye mezaxtin, û eva jî vê para xerckirinê nagire ku bi sedema cezayên aborî tûşî welat bûne. Li gorî axavtina serokê Dezgeha Berjewendiyê Rejîmê, di heya ma heşt salên borî de zêdetir ji 800 milyar dolar, zirara aborî li welatê Îranê ketiye, ku bi tewahî, û perê mezaxtî (xerckirî) bo pirojeyan û zirara çend salên borî jî, zêdetir ji 1000 milyar dolar e, ku bi sedema serberdayî û zêderewiyên rejîmê di warê navikî de, zirarê gihîştîye aborî û jiyana neteweyên Îranê.

Piştî vê hemû zirarê û piştî bê hitbarbûna reng û rûyê xelkê Îranê, û bi terorîstnasîna rejîmê di raya giştî de, rejîma Îranê bi çok de hat, û bê çine zirareke wisa gehandiye xelkê Îranê.

Piştî çendîn biryarnamê û çendîn biryarên cezakirin û gemaroyan li dijî Komara Îslamiya Îranê ji aliyê Rojava ve, mezinên Komara Îslamî bas ji bê mifahî û bê bandorbûna van biryar û gemaroyan dikir, û heya rejîmê bas ji vê fikir ku li jêr

van gemaroyan de zêdetir geşe dikin, û wê destanrêsiya aborî biafirînin, û di rewşa Bedr û Xeyberê de ne. Lê dewleta nû ya rejîmê ew yek qebûl kir ku xizîneya dewletê betal e, û heya ew qas pere tunînin ku mehaneya karsazên xwe jî bidin, û tu pere ji bo dana yaraneya mehane tunînin.

Di rewşeke wisa de ku li jêr zexta herî tund ya gemaroyan de bûn, û pere ji bo domandina projeyên xwe ên terorîstî û navikî tunebûn, ji bo mana xwe, ne ji bo rewşa nebaş ya xelkê welat, stûyê xwe li hemberî zextên civaka cîhanî de tewandin.

Ew lihevhatinname ku li 24.11.2013 li Cinevê û di navbera nûnerê rejîmê û grûpa 5+1 hate îmzekirin, rêvebinnameyek demkî ye bo heyama şeş mehan, ku dibe di vê heyamê de, rejîma Îranê van xalên ku îmze li ser kirine, û soz û qewlên ku dane, cîbicî bike, hekî ne wê gemaroyên zêdetir û zextên zêdetir bi ser wan de bisepînin. Herçend ku tu baweriyek bi vê rejîmê nahê kirin, û çendîn carî selimandiye ku rêvebinnameyên navneteweyî îmze dike, lê piştî hemû bînpêkirine, her bi sedema vê xatircemnebûnê ye ku di vê lihevhatinê de hatiye ku her şêwe bînpêkirina soz û qewlan, cezayan tundtir dike.

Hekî rejîma Komara Îslamî girêdayî bi qewlên xwe be, rene qazancê wê ji xelkê Îranê re ew be ku êdî pere û samana welat bo zêderewî û projeya çeka navikî xerc neke, lê ew yek vê xatircembûnê nade ku ew pere bo xweşderbazkirina xelkê bihê xerckirin, lê herwekî di berê de rejîmê nîşan daye, mezaxtina serwet û heyîya welat di pêxema geşandina terorîzmê û çekdarkirina Hizbullah Lubnan û rejîma Beşar Esed û girûp û cihên din dike di serweyî her tiştî dibe, û heke tiştê jê bimîne, wê ji bo çekdarkirin û teyarkirina hêzên xwe ên ewlehiyê xerc bike û para xelkê hejar ên Îranê her serkut e.

Ya ku cîhan û welatên azad û rêkxirawên alîgirê mafê mirovan nabe ji bîr bikin ew e ku kêşeya Komara Îslamî ya Îranê ji bo herêm û cîhan û welatê Îranê tenê kêşeya çeka



navikî û projeyên navikî nine, belkû berî her tiştî rejîma Îranê rejîmeke serberedayî û dîktator e ku li sedsala 21'an de bi awayê sedsalên navîn hikûmetê dike û xelk û bi taybetî neteweyên Îranê diçewsîne, û sitema aborî û siyasî û neteweyî li wan dike.

Gêre û kêşeyê din ya Komara Îslamiya Îranê bo herêmê pîrsa geşandin û piştevanîkirina ji terorîzmê û tevdanîkarî û tundrewiyê di cîhanê û destêwerdana di nava karûbarên welatên herêmê û kûrtîkirina kêşeyan e, herwek li Sûriye, Îraq û li Behrîn û li gellek cihên din ên cîhanê bi eşkereyî alîgirî û piştevaniya tevdanîkarî û tundrewiyê dike.

Herçend ku herwekî derbazbûyî nîşan daye Komara Îslamiya Îranê li hember girêbestên navneteweyî xwe berpirsyar nizane û rene li îmzekirina girêbesta Cinevê jî bo bidestxistina demê û ragirtina demkî ya gemaroyan mifahê bistîne, lê bi vî halî jî:

PDKÎ

-Kêfxweş e ku hekî ew lihevhatinê bê cîbicî kirin, rene beşeke berçav ji serwet û samana welat ku hewce ye ji bo baştirkirina rewşa jiyana xelkê û avedankirina welatê xerc kirin, êdî bê çine ji bo geşekirina projeya navikî ya Îranê nehê kirin, ji bilî vana, encama sivikkirina hinek ji gemaroyan ji aliyê Rojava ve, bandordar be li ser jiyana aboriya xelkê û ew kêmasiyên ku xelkê Îranê bêzar kiriye.

-Daxwazê ji civaka navneteweyî dike ku li egera domandina vê lihevhatinê heya şeş mehan, Komara Îslamî ya Îranê neçar bikin ku di warê mafê mirov, dana azadiyên siyasî, azadiya girtiyê siyasî, û ragirtina îdamên, û herwisa pesendkirina mafên siyasî

Dom R: 5

Deqa Gotûbêja taybetî ya Tishk TV, digel birêz Mistefa Hicrî sekreterê giştî yê PDKÎ

H: Fexredîn Hisam Mokrî



Bînerên birêz yên Tishk TV, silav û ev dema we baş, Em di xizmeta we de ne bo pêşkêşkirina programeke taybetî derheq komeke pirsên siyasî ên di rojevê de.

Zanîna boçûnên PDKÎ li ser civaka siyasî ya Îranê, ew bûyerên rojevê ku li Îranê û di van dawiyane de rû dane, bi taybetî Kurdistan û rewşa Kurd di vê herêma coxrafîyayî de.

Bi xweşî ve em pêşwaziyê dikin ji rêzdar Mistefa Hicrî sekreterê giştî yê PDKÎ bo vê ku boçûnên ve partiyê li ser van pirsan bizanin.

Kekê Mistefa Hicrî! Gellek sipas ku we ew daxwaza me qebûl kir.

Mistefa Hicrî: Sipas ji we re jî.

Pirs: Di pêwendî di gel Îranê de, ez dixwazim ku basên xwe dest pê bikim û dixwazim bi vî awayî deriyê ve basê vekim ku nêzik bi sed roj bi ser dest bi karbûna Hesên Rûhan re derbas dibe. Berî hilbijartinan hûn wekî PDKÎ we daxuyanîyek da, û we baykota hilbijartinan kir,

we pêşbîniya ve kiribû ku xelk bi hatina Rûhanî dilxweş in, lê rewşa Îranê pîr xiraptir dibe, gelo ew pêşbîniya we li ser çi bingehekê bû, û gelo bi rastî we jêve ye ku niha rewşa Îranê xiraptir bûye?

Bersiv: Daxuyaniya Deftera Siyasî derheq baykota hilbijartinan serkomariyê çavkaniya wê vedigere ser ve ceribandina ku em wekî Kurd bi taybetî û wekî Îranî bi giştî, di heyama sî û çend salên borî ên deshilatdariya Komara Îslamî ya Îranê de me hebûye, ji bilî ve yekê pirsê îdeolojiya Komara Îslamî ku li dijî demokrasî, azadî, û daxwazên neteweyên Îranê, bi taybetî li dijî daxwazên Kurdan e, û ew ezmûn hertim di dema hilbijartinan de ducarî bûye ku hinek soz û qewlan didne xelkê, bo ve ku bala xelkê bo aliyê xwe rakêşin û wan bikêşne ser sindûqan, lê herwekî min bas kir, îdeolojî û siyaseta Komara Îslamiya Îranê îzna ve yekê nade ku Îran ber bi vekirinê ve here, û ew baykota jî di çarçoveya ve boçûnê de hate ragehandin, û em niha ku li bereberê sedrojîya dest bi karbûna serkomarê rejîmê de ne, em dibînin ku diruşmên Rûhanî derheq qewlên ku dabûne xelkê Îranê, bi taybetî bi Kurd û

neteweyên din derheq vekirina rewşa siyasî li Îranê, û azadbûna girtiyên siyasî, û gellek qewl û sozên din, mixabin em dibînin ku her wekî serkomarên din, her di cihê xwe de ye û di hinek waran de tundûtîjtir jî bûye.

Pirs: Di van dawiyane de pêleke îdaman Îran dagirtiye, hekî bê bîra me, we mijarek nivîsand ku gelo Komara Îslamiya Îranê ber bi guhertinan pêngavan davêje yan ne, di vir de we pêşbîniya ve yekê kiribû ku rewş gellek xiraptir dibe û Komara Îslamiya Îranê bi dana komeke poanan serkuta navxweyî zêde dike, li ser çi bingehekê we ew dadweriya kir?

Bersiv: Her wekî min di mijara xwe de jî basê kiribû, li ser ve bingehe pêşbîni hatibû kirin ku Komara Îslamiya Îranê her di destpêkê de heya niha hemû hewlên wê bona ragirtin û parêzgarîkirin ji rejîma xwe ye. Hekî bas ji Îslamê dike, û bas ji demokrasî, mafên xelkê hejar dike, ew hemû ew vir û direv in ku ji bo parastina hikûmeta xwe bi kar tîne, û me ew yek ne tenê di îdeolojiya rejîmê de nas kiriye, belkû bi kiryar jî me dîtiye, hekî di bîra me de be, di dema şerê heşt sale yê di navbera Îran û Îraqê de piştî ve ku xelkekî zaf dane kuştin, û piştî zirareke malî ya bê qas, dema ku Refsencanî û herwisa komeke fermandeyên payebilind ên leşkerî çûne cem Xomênî û ew têgehandin ku hekî ew şer berdewam bike, ew wê şikestê bixwen, Xomêynî bi qewlê wan bi xwe, cama jehrê vexwar û girêbesta NY qebûl kir û agirbes ragehand û hemû ew vir û direv û diruşmên ku dabûn ku ji riya Kerbelayê ve ew dê Qudsê rizgar bikin, hemû bû direv, eva bixwe ezmûnek bû.

Niha jî ew mijara ku hatibû nivîsîn beşeke wê li ser ve bingehe ye ku Komara Îslamiya Îranê bo ragirtina hikûmeta xwe hewcehî bi ve ye ku deriyên xwe bi rûyê welatên derve veke, ew gemaroyên ku bi ser Îranê de sepandine, derheq mehandina oranyomê û ew piroseya ku dest pê kiriye, her dom heye, û ew yek bûye sedema ve ku gemaro gihîştine ve astê, ku Komara Îslamî hest bi tirsê dike, ku hekî her doma hebe, êdî şiyana

wan ya birêveberiya welat namîne, ku wisa bû divêt ew hikûmetê biparêze, û parastina ve hikûmetê jî berevajiyê diruşmên Xamîneyî di rastî de lihevhatineke rezîlane ye digel Rojava bo ve ku teslîmî daxwaziyên wan be, da ku Rojavayî gemaroyan li ser wan heya qasekê şil bikin, da ku bikare dahata petrola xwe bi dest bîne. Ku wisa bû xwezayî ye ku Komara Îslamî li hemberî parastina hikûmeta xwe de poanan bide Rojava.

Lê aliyê din yê ve pirsê ku lihevki-rina digel xelkê Îranê û vekirina rewşa siyasî bi rûyê xelkê de ye, eva rast berevajiyê armanca Komara Îslamî ye, bi ve manayê ku xelkê Îranê ji ber ku Komara Îslamî nas kirine, û ji ber ku jê nerazî ne, her demekê ku rewşa hewce bê pêş, yan jî hecetek ketibe destê wan de, li dijî rejîmê hatine ser şeqaman û diruşma hîloşîna Komara Îslamiya Îranê dane. Lewra her paşvekêşaneke Komara Îslamiya Îranê derheq pirsê demokrasî û azadiyê bi taybetî mafê neteweyên Îranê û yek ji wan neteweya Kurd, li gorî şik û gumana Komara Îslamiya Îranê dibe sedema hîloşîna Komara Îslamiya Îranê. Lewra me got ku hekî deriyên xwe bi rûyê cîhanê de vedike, berevajî di navxwe ya welat de rewşê tundûtîjtir dike, û mixabin em ve yekê niha dibînin.

Pirs: sedem çi ye ku ew rewşa ewlehiya xirap bi giştî di Îranê de, û bi taybetî di Kurdistanê de pêk aniyê?

Bersiv: Di rastî de bingeha wê vedigere ser ve tirs û lerza ku ji xelkê Îranê heye, jiber ku ew bixwe tevî wan hemû îdiayên ku dikin, berevajî gellek baş dizanin ku xelkê Îranê di gel Komara Îslamî de nînin. Valahiyek gellek zêde ketiye navbera xelkê Îranê û Komara Îslamiya Îranê de, ku roj bi rojê ew valahî berfirehtir dibe, lewra hekî xelk derfetê bi dest bînin bo hîloşandina rejîmê, bê guman wê hewla xwe bidin, û rola neteweyên Îranê ku tewahiya sînorên Îranê pêk anîne, roleke giring dibe. Komara Îslamiya Îranê ji ve nîgeran e ku ew rewş di Îranê de bê pêş, lewra pêşiya tewahiya civînan digre, pêşiya hemû daxwaziyên azadîxwazane digre, hukmê

girtina dirêjheyam bi ser girtiyan de disepîne, û bo tirsandina xelkê, me dît ku pêla îdaman daye dest-pêkirin. Ew xortên neteweyên Belûç, Ereb, û bi taybetî tekoşerên Kurd îdam dike, bona vê ku xekê bitirsîne.

Pirs: kekê Mistefa bi raya we encama sefera Rûhanî bo Niyoyorkê û axavtina telefonî digel Obama û herwisa hevdîtina Zerîf di gel Can Kêrî û bi giştî gotûbêjên 5+1 digîje kuderê?

Bersiv: Her wekî min got, Welîyê Feqîh tenê kesek e ku biryarê li ser siyasetên navxweyî û derveyî welat dide, wisa dixuye ku ew gihîştibê vê qenaetê ku êdî ji vê hindê zêdetir ew nikarin berxwedaniyê bikin û rewşa wan ya aborî jî gihîştîye xalekê ku êdî nikarin xwe bi rêve bibin, lewra Welîyê Feqîh ew biryar daye ku divêt ew deriyên xwe ber bi cîhana derve vekin. Bi boçûna min Xamineyî gihîştîye vê qenaetê ku divêt ew vekirina deriyên bibe dana poana bi Rojava, û teslîmbûna li hemberî daxwaziyên wan, eva encama wê di wan civînên ku di Jinêvê de pêk hatin, û destpêka wê jî di Niyoyorkê de bû, niha jî ku dawî civîna wan di Jinêvê de birêve diçe, hemû hewla wan eva ye ku bigîjne encamê, û digel vê ku min jêve ye hêştaya maye, lê di encamê de Komara Îslamiya Îranê wê bêteser ve baweriyê ku teslîmî Rojava be, bona ku tirsana hîloşîna xwe di warê aborî nehêle. Bi raya min Rojava li hemberî gellek poanan de, wê kêmek poanan bide Komara Îslamiya Îranê, û Komara Îslamiya Îranê derheq pirsê mehandina oranyomê teslîm dibe.

Pirs: Ew edebiyatekê bi kar tînin ku "nermîşê qehremanane" ye, ku di dawiyê de her wekî cenabê te got rege ew haleta bê pêş, keko ez dixwazim ku pirsyarê girê bidim bi Kurdistanê li pêwendî digel mafê Kurd, we gotûbêjek kiriye di gel Ajansa Anadol a Turk, û we bas kiriye ku hûn amade ne ku gotûbêjan digel Komara Îslamiya Îranê bikin, hekî mafê Kurdan garentî bike, lê we komeke şert û merc danîne, di destpêkê de ew bas çawan hatiye holê, gelo tu signalek yan amajeyek heye, gelo tu gotûbêjek di navbera we û Komara Îslamiya Îranê di vî heyamî de hebûye?

Bersiv: Pêştir dixwazim vê yekê şirove bikin ku tu çirayeke kes

û tu gotûbêjek ji aliyê Komara Îslamiya Îranê ve nîşanî me nehatiye dan ku amade bin ku gotûbêjan bikin, di vî warî em ne bawer in ku Komara Îslamiya Îranê di rewşa niha de bikeve nava piroseyeke wisa de, ji ber ku berî her tiştî bawerî bi wan mafan niye ku em daxwaz dikin, û ji aliyê din ve jî rewşa ewlehiyê gellek ji vê tundûtîjtir e ku di Komara Îslamiya Îranê de basa mafê neteweyan bê kirin. Dema ku bi heceta herî biçûk tekoşerên siyasî, bi taybetî Kurd digrin û dêxne girtîgehan de, û piştê jî îdam dikin, yan digel neteweyên din wisa reftarê dikin, yan jî niha Komara Îslamiya Îranê kêşe û arîşeya wê ew e ku gelo serpûşa jinan divêt çawa be, û tûka serê wan çiqas bê veşartin û çiqas nehê veşartin, di rewşeke wisa de çavniheriya gotûbêjan çavniheriyeke bê çine ye, lê em wekî kesên siyasî dikevne pêşberî pirsyarên rojnamevanan de, ew pirs dikin ku gelo hûn amade ne bo gotûbêjê yan ne?

Min bersiv daye ku em wekî pirs-sîpeke giştî ku di PDKÎ de heye, dema ku Komara Îslamiya Îranê amade be ku li ser mafê neteweya Kurd bi navbeynkariya aliyê sêyemîn, amade be, em jî amade ne ku gotûbêjan bikin, ew yek nahê ve wateyê ku tişteke wisa hebe û Komara Îslamiya Îranê çirayakesk nîşanî me dabe, lê ew bi tenê bersiva pirsyara nûçegihanekî bû.

Pirs: Di demên borî de û di van çend mehên borî de, we dest bi meşeke nû ya dîplomasiyê kiriye, û we dewleta Turkiyê kiriye armanc, ew qasê ku ez şaş nebim we di salvegera avakirina Komara Turkiyê de beşdarî kir û ji vê jî girîngtir we beşdariya di civînekê de kir, ku piştê ezê ve pirsê li we bikim. Li derheq pirsê Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê û li ser vê dîplomasiyê dixwazim pirsê li te bikim, çawan e ku we meşeke wisa ya dîplomatîk dest pê kiriye?

Bersiv: Bo me wekî PDKÎ em hertim li ser vê bawerê bûne ku divêt em digel welatên bi bandor ên cîhanê bi taybetî ên herêmê pêwendiyên danên, pêwendiyêke salim ya siyasî, li ser rêzgi-tina hevdu, li vê derheqê de em di nava hewldanan de bûn, eva bû ku me beşdarî di salvegera avakirina Komara Turkiyê de kir ku em hatinbûne bangkirin, ji bilî vê jî ew bangkirina ku di rastî de nawendeke ne hikûmetî, yanî

nawendeke lêkolînê ya li ser pirsê Kurd bû, pêk anîbû, û bo wir em hatinbûne bangkirin û nûnerê me beşdarî tede kir û gotar xwend û program û daxwaziyên PDKÎ bas kirin.

Pirs: Li ser vê kongireyê dixwazim ku zêdetir em biaxivin, bo yekem car e ku li Enqerê de serbarê wan zextên ku pêştir ji aliyê hikûmeta Turkiyê ve em şahid bûn, lê em hest bi vekirineke siyasî dikin. Li Enqerê dewleta Turk kongireyê pêk tîne û seranên partiyan û aliyê kêma nûnerên partiyan siyasî ên her çar parçeyan, basê bidestveanîna mafên xwe dikin, û basê mîkanîzma gihîştina bi wan mafan tê kirin, hûn wekî PDKÎ her wekî we kerem kir, we li wir nûner hebû, gelo deskevî çî bûn, bas çî bûn, hûn gihîştine çî encamê?

Bersiv: Eva bixwe pirsê giring e ku di welatekî wekî Turkiyê de ku anîna peyva Kurd hatibû qedexekirin, û kesê nedikarî basê pirsê Kurd bike, lê niha em dibînin ku li Amedê, pîspor û şarezayên her çar parçeyên Kurdistanê kom dikin, bona vê ku bas ji çareserkerina pirsê Kurd di herêmê de bikin, ew yek nîşan dide ku ew dewlet, dewleteke siyasî ye û ber bi pêş ve pêngavan davêje ku ber bi çareserkerina kêşeyên xwe ve here, û dixwaze bibe alahilgirê çareseriyê pirsê Kurd di herêmê de.

Eva bixwe pêngaveke gellek giring e û guhertineke berçav e, lewra xwezayî ye ku emê di civînên wisa de beşdarî bikin û pêşwaziyê lê bikin, jiber ku me jê ve ye ku li her welatekî de bi taybetî di welatên dagîrkar de rewş bo gotûbêjê, û dîplomasiyê amade be, em wekî Kurd divêt tede beşdar bin û ji vê riyê ve tekoşîna xwe ber bi pêşve bibin, û em bi hukmê ve ku wekî Kurdistanê Îranê, me sînoreke dûr û dirêj digel Turkiyê û beşek zaf ji gelê Kurd yan meztirîn beşa gelê Kurd di Turkiyê de heye, em hem li gorî rastiya îro û hem jî li gorî rewşa siyasî hewce dike ku pêwendiyê bihêz bikin, û bikarin pêwendiyêke baş digel dewleta Turkiyê danên, bona ku em jî bikarin bernameyên xwe digel wan bas bikin, hem jî digel Kurdên Turkiyê ku hemwelatî û hevzimanên me ne.

Pirs: Her di vê derheqê de ku we kerem kir ku xelkê Kurdistanê Bakûr hevziman û

hevniştimanên me ne, ez hez dikim ku pirsê bikim, gelo çûna Mesûd Barzanî ya hefteya borî bo Diyarbekirê, hûn çawan dinirxînin, çî guhertinek hatiye pêş?

Bersiv: Di rastî de eva jî bixwe mîna keke din ya vekirîbûna dewleta Turkiyê bi rûyê kêşeyê ye ku bi dehan salî ye digel vê kêşeyê berbirû ye, ku ew jî pirsê Kurd e, hekî di bîra me de be, li salên destpêka Hikûmeta Herêma Kurdistanê, heyameke zaf Turkiyê amade nebû ku herêma Kurdistanê wekî hikûmet nas bike, heya amade nebû ku Barzanî wekî serokê Herêma Kurdistanê binase, belkû wekî serok eşîr basê dikir, lê guhertinên siyasî û pêşkevtinên siyasî, kareke wisa kirin ku Turkiyê ji vê rastiye tê bigîje û di vê pêwendiyê de pêngvan hilgire, ew çûna rêzdar Mesûd Barzanî bo Turkiyê deskevteke din ya herî bi nirx ya hikûmeta Herêma Kurdistanê ji aliyê û ji aliyê din ve Turkiyê bû. Di vê seferê de gellek tabo hatine şikandin, û berî her tiştî ew civîn li Amedê hate pêkanîn, ji bilî vê yekê jî ew peyven ku li wir bi kar hatin, yanî eva ku rêzdar Mesûd Barzanî Turk û Kurd bo aşiyê û bo bidawîna xwînêrîna, û pêdagiriya li ser çareseriyê aşiyane han dan, û herwisa ew pêşwaziyê ku ji kak Mesûd hate kirin, xaleke yekcar bihêz bû, ji aliyê ve nîşan da ku xelkê Kurd di vê para Kurdistanê de rîya çareseriyê aşîxwazane dixwazin û pêşwaziyê ji kak Mesûd dikin, bi vê sedemê ku alahilgirê aşî û pêkvejiyana her du gelên Kurd û Turk e di vî welatî de, û di vê derheqê de hewlê dide û bixwe hikûmeta Turkiyê jî û Erdoxan jî gellek axavtinên nû kirin derheq pirsê Kurd, û navê Kurd bi eşkere anîn, û basê ve kirin ku pirsê Kurd êdî wekî pirsê Kurd bas dikin ku pêştir bi peyven sivik basa pirsê Kurd dikirin, û basê ve kirin ku deriyên girtîgehan wê vekin, eva bixwe nîşan dide ku ew sefera bixwe bi wateya destpêka pêşkevtinên dinê ye jî, ji koma van boçûna min jêve ye ku sefereke serkevtî bû, û gellek bi qazancê gelê Kurd bû. Bi giştî bo hevsnorî û girêdana pêkve ya pêwendiyên nêzîk û dostane di naberê Herêma Kurdistanê û Turkiyê baş bû.

Pirs: Di vê heyama borî de hikûmetêke demikî ji aliyê PYD'ê ve hatiye ragehandin, di vê derheqê de serokatiya Herêma Kurdistanê daxuy-

Nerîna Lîderan



Mesûd Barzanî:

“Leyla Zana û hevalên wê, ji riya PDK'ê ve, di navbera PYD û ENKS'ê de, wê navbeynkariyê bikin”.



Kîşanaka:

“Hewce ye ku Tîrkiye birêvebirina perwerdehiya herêmên Kurdan bide destê Kurdan”.



Îmad Ehmedî:

“Emê hewil bidin ku bi Îran û Sûriyê re jî girêbestan îmze bikin”.



Gî Karmerî:

“Pesendkirina gemaroyan li dijî Îranê, wê hecetan bide dest Îranê, da ku naweroka lihevkerinê cîbicî neke”.

anî daye, ev daxuyanî gellek jî bi xirapî hatiye şirovekirin, hûn di bingeh de avakirina vê hikûmeta demkî di Kurdistanê jêr deshîlata Sûriyê de çawan dinirxînin?

Bersiv: Ev rastiya ku îro di Kurdistanê Sûriyê de derbaz dibe, rastiya ku hekî di mehên destpêkê de kêmekê ne zelal bû, niha êdî bi tewahî zelal bûye, ew jî bi vê wateyê ku hikûmeta Sûriyê di rastî de digel vê ku hêzên wê her di Kurdistanê Sûriyê de ne, lê li wir çalak nînin, deshîlata wir daye destê hêzeke Kurdî, ku di wir de deshîlata xwe bi kar bîne.

Hebûna her hikûmeteke xweçihî bo Kurdên Sûriyê wekî hemû parên Kurdistanê deskevteke gellek giring e, û divêt hemû aliyekê piştevaniyê jê bike, lê bi şertekê ku eva deskevta Kurd be, û hikûmeta Kurd be, ne hikûmeta aliyekê be ku bi zorî bi ser xelkê de sepan dibe.

Gelê Kurd zêdetir ji sed salî ye ku xebatê bo azadiyê û rizgariya ji destê zordariyê dike, eva nayê vê wateyê ku Kurd xebatê dike bona vê ku li jêr deshîlatxwaziya Turk û Ereb û Fars rizgar be, lê deshîlatxwaziya Kurd qebûl bike, bi taybetî ew serdem nemaye, lê ew hikûmet min jêve ye ew hikûmeta xweçih yan her naveke din em li ser danên, em demekê dikarin bêjin hiukûmet, yan deshîlata Kurdê Sûrî, ku Kurdên Sûriyê têde beşdar bin, û bikarin hemû bi azadî û bi mafê wekhev bîr û boçûnên xwe eşkere bikin, lê mixabin ya ku em niha di wir de dibînin berevajî ye, beşeke zaf ji ên ku cudabîr in, digel vê deshîlata ku li wir pêk hatiye, li jêr zext û zoriyê de ne. Azadiya tekoşînê nînin, û hejmareke zêde ji tekoşerên rêkxirawên kurd ên Sûriyê hatine terorkirin, ku ew yek cihê şik û gumanê ye.

Serdemekê ew propaganda bilav

Doma R: 2



Birêz Mistefa Hicrî: “Gelê Kurd zêdetir ji sed salî ye ku xebatê bo azadî û rizgariya ji destê zordariyê dike, eva nayê vê wateyê ku Kurd xebatê dike bona vê ku li jêr deshîlatxwaziya Turk û Ereb û Fars rizgar be, lê deshîlatxwaziya Kurd qebûl bike, lê ew hikûmeta xweçihî, yan her naveke din em li ser danên, em demekê dikarin bêjin hikûmet, yan deshîlata Kurdê Sûrî, ku Kurdên Sûriyê têde beşdar bin”.

kirin ku komkujî hatiye kirin ji aliyê girûpên El-Nosre û girûpên din ên radîkal ve, lê eşkere bû ku wisa nebûye, lewra ez xwe vê yekê bi rast dizanim ku Kurd hemû li wir bikarin her şêwe deshîlatekê ava bikin, niha derfeteke baş e ku ez hêvîdar im ew yek bi hev girtinê ser bigre û aliyek bi tenê nexwaze bi qazanc û berjewendiya xwe, ku berjewendiya wê bixwe jî di vê yekê de nine, bixwaze vê derfeta baş ku li wir pêk hatiye, ji nav bibe, di vê derheqê de ez digel axavtinên rêzdar Mesûd Barzanî me, ku derheq Kurdistanê Sûriyê ragehandiye, çî derheq alîkariya mirovî, ku heya niha wekî Kurdên Kurdistanê Îraqê kirine, çî jî wekî Hikûmeta Herêma Kurdistanê kirine, niha jî ew alîkarî berdewam in û herwisa ew hewl û tekoşîna ku hatiye kirin bona vê ku Kurdên Sûriyê bi awayekî yekdest û yekgirtî bikarin biryarê bidin, ne tenê aliyek bi tena serê xwe biryarê bide û biryara xwe bi ser aliyê din de bisepîne.

Pirsyar: kekê Mistefa Hicrî, dawî pirsyara min ji cenabê we, bo berçavroniya bînerên me, mijareke pîrr hestiyar e bo Kurdistanê Îranê, ew jî ev e ku birêz Xalid Ezîzî di gotûbêjekê de basekê dike ku wan nivîsekê daye Deftera Siyasî ya PDKî bo yekgirtinê, di vê derheqê de ez dixwazim ku hûn raya giştî ya Kurdistanê zêdetir agehdar

bikin?

Bersiv: Belê, ya rastî ev e di kongireya PDKî ya dawiyê de biryarek hate dan, û em li gorî vê biryarê têkiliyên xwe bi hevalên xwe ên pêşîn re dadinên, em li ser gellek mijaran lihev dicivin û bi hev re hemşêvriyê dikin, derheq wan mijarên ku pêwendî bi Îran û Kurdistanê ve hene, em vê rewşê didomînin, lê xwezayî ye ku eva dawiya vê pirsê nine, û biryar ew e ku asayîbûna têkiliyan bigihîje asta yekbûnê.

Me berî vê gelaleya ku birêz Xalid Ezîzî bas dike, me nivîsek amade kir û ji wan re şand, wate piştî cudabûna wan hevalan, û biryar bû em li ser vê nivîsê bi hev re biaxivin, û riyekê ji bo hev girtinê bibînin, lê mixabin wan bersiva me nedan û niha bixwe gelaleyêke cuda amade kirine, û cudahiyeke zaf di navbera gelaleya wan û ya me de heye.

Lê emê di civîna Komîteya Nawendî de li ser vê mijarê biaxivin. Lê giring ew e ku me pêştir gelaleyêke daye wan û hekî ew daxwaz bikin ku bi sedema derbazbûna dem, em hinek guhertinan têde pêk bînin, eva cihê behsê ye, lê eva ku ew gelaleya me ret bikin û gelaleyêke din di cihê wê de amade bikin, di warê siyasî de hûrbûniyêke zêde dixwaze, lê emê vê piroseyê bidomînin.

ên neteweyên Îranê û yek ji wan neteweya Kurd pêngavan hilgire.

-Bi çok de hatina rejîmê li hemberî civaka navneteweyî ew rastiya selimand ku ew rejîma serbarê hemû xwe hilkêşan û gefxwarinan çende perîşe û bê deshîlat e ku bi bê tu êrîşeke leşkerî îdiya wan ya ku tu car tîk naşikên pûç bû, guman têde nine ku li hemberî hêza yekgirtî ya xelkê jî herwisa

lawaz e. Lewra cihê hêvîdariyê ye ku xelkê Îranê jî ku lawazî û tirsinokiya vê rejîmê bi çavê xwe dîtin, pêdagirtir û bi bawertir ji berê, bo mafên xwe ên binpêkirî bi awayekî yekgirtî berbîne canê rejîmê, û bo hertim xwe ji destê Komara Îslamî rizgar bikin.

PDKî
Deftera Siyasî
06.09.1392
27.11.2013



Hesen Rûhanî jî, ji Kurdan re rast negot

Dara Natiq



Di heyama çend mehên borî de xelkê Kurdistanê bi giştî û gellek ji rewşenbîr, çalakvan, û reformxwazên Kurd di navxwe ya welat de, li ser bingeha wan qewl û sozên ku Hesen Rûhanî di dema propagandeya serkomariyê de, wekî çibçikirina beşeke kêr ji xwestek û daxwziyên kêr neteweyan, û bi taybetî danîna kesên xwecihî di îdareyên wan herêman de, dabûne wan, lewra ew jî çavniherê reform û hinek guhertinên dilxweşker û piraktîzebûna sozên serkomar bi atybetî di warê diyarîkirina kesên Kurd û xwecihî bo posta serokatiya parêzgehên Kurdistanê bû.

Mixabin ezmûnên salên derbazbûyî ên vê rejîmê û karnameya çend mehî ya hikûmeta Rûhanî bi taybetî di warê diyarîkirina kesên ne Kurd, û ne xwecihî, û kesên ku karê leşkerî û ewlehiyê kirine,

bo parêzgarê herêmên Kurdakincî berevajiyê wan soz û qewlên Rûhanî di dema bangeşeya hilbijartinê de bûn, ku dabûne çalakvanên Kurd.

Bi taybetî li serûbendê diyarîkirina parêzgar bo parêzgehên Kurdistanê bo yekemîn car di dîroka deshilatdariya Komara Îslamî de basa danîna Kurdekî Îlamî wekî parêzgarê Urmîyê hate kirin, û eva jî serbarê hebûna têbîniyan li ser derbazbûyiya karê ewlehiyê û karê leşkerî yê wî kesî, ji aliyê reformxwazên Kurd ve wekî pêngaveke erênî derheq xwestekên Kurdên vê parêzgehê hate hesabandin.

Ev propagande, ne tenê bû sedema gefxwarinên kesên şovenîst û kesên birteng ên Turkên Azerî, di vê herêmê de, belkû retkirina wê ji aliyê kabîneya Rûhanî û danîna kesekî Turkê Azerî bo

parêzgeha vê herêmê, ew yek selimand ku rejîm heya baweriyê bi wan Kurdan jî nake ku pişt li neteweya xwe kirine, û bi tewahî di nava felsefeya Wilayeta Feqîh de heliyane, û parêzerê berjewendiyên vê nizamê ne, ji aliyê din ve jî nîşan da ku bê bawerî û dîtingeha emniyetî ya rejîmê li hemberî xelkê Kurdistanê siyaseteke neguher û bingehîn ya vê rejîmê ye.

Vekişyana Rûhan ji tewaya sozên xwe ku dabûne kêmteweyan, û bi taybetî Kurdan, nîşaneya berdewamiya siyaseta vêdedan û asîmîlekirina neteweyên bindest, û geşekirina zêdetir ya rewş û hewayê polîsî û ewlehiyê li Kurdistanê û lêbandiana xelkê Kurdistanê, û mifahwergitin e ji dengê xelkê bi armanca rewayîdana bi kiryarên ne rewa û dijî mirovî ên xwe.

Xelkê Kurdistanê bi giştî û çalakvan û reformxwazên Kurd hewce ye ku vê yekê bizanin ku ezmûna zêdetir ji sê dehikan deshilatdariya biyom ya Komara Îslamiya Îranê, eşkere kiriye ku ew rejîma reformhilgir nine, û dîtingeha ewlehiyê û siyaseta guherîna demografiyaya herêma neteweyên bindest û bi taybetî Kurdistan, sitratejiyeye bingehîn ya berdewam e, û nabe êdî xelk li pey kumê ba birî bikevin.



H: Rehîm Gergulî

Ebdulla Ebasî naskirî bi "Pola" kurê Xudakerem, sala 1327'an (1948) li gundê "Wizman" a ser bi bajarê Diwanderê tê dinê.

Ebdulla Ebasî her di zarokatiya xwe de babê xwe ji dest dide û xwedîkirina wî dikeve stûyê kurmamê wî. Kurmam jî tevî Pola pir xirab dibe û nahêle ku pola here xwendîgehê û bi vî awayî ji xwendinê bêpar dibe. Lewra Ebdulla Ebasî dibêje ku her di zarokatiya xwe de min jiyaneke zehmet û pir ji êş û elem derbaz kiriye.

Ebdulla Ebasî derheq nasyariya xwe bi PDK Îranê re dibêje: "Li derdora me xelkê pir basa PDK Îranê û Komelê dikirin, min nedizani ku PDK Îranê kîjan partî ye, lewra min ji xizm û kesûkarên xwe berdewam pirsyar dikir û ewan jî, ji min re digotin ku hekî rojekî herî nava partiyek Kurdî de, gereke tu herî nava PDK Îranê de, eva bû ku min PDK Îranê naskir, û min ew partî ji xwe re bo pêşmergegiyê hilbijart".

Pola tevîbûna xwe bi PDK Îranê re weha tîne ziman: "Bo cara yekemîn sala 1362'an(1983) min li gundê "Tewekilan" a derdora me pêşmerge dîtin, wî çaxî Kak Şahrox fermandeyê hêza Dîwanderê wate hêza 2'ê Rêbendanê bû. Piştî midehekê ez tevî partiyê bûm û bûm pêşmerge. Her di yekemîn roja pêşmergegiyê de em ketin nava şerek giran tevî hêzên kirêgirtî ên Komara Îslamî, min tucaran şer nedîtibû û nekirbû, lê bi vî halî jî min şereke pir ji lehengî kir, piştî wî şerî nasnavê Pola, bi min hate dan".

Pola dibêje: "Di heyamê pêşmergegiya xwe de 7 caran birîndar ketime. Dema nexweşxaneyê PDK Îranê li Gewredêyê bû, ez bi giranî birîndar ketim, Şehîd Qasimlo hat û gellek daxwaz ji min kir ku bona çareseriyê birînen xwe ber bi derveyî welat herim, lê min daxwaza wî qebûl nekir û jêre got hekî qirar be ez bimrin, dibe di nava partiya xwe de bimirim".

Ebdulla Ebasî derheq rojên herî xweş û nexweş ên jiyana xwe dibêje: "Rojên herî xweş ên jiyana min ew roj bûn ku me xwe berhev dikir bona çûyîna menteqê û



me'muriyetên partiyê. Lê roja herî nexweş a jiyana min roja şehîdketina rêberê gelê Kurd Dr. Qasimlo bû. Wê rojê em li derdora Banê bûn û ber bi devera Seqizê diçûn, em pir dilgiran bûn, û di hember vî cînayeta Komara Îslamî de, li bilindahiyên Kêwêreşê me emeliyatek kir ku sed kes ji hêzên Komara Îslamî bi dîl hatne girtin, û hejmara kuştîyan jî bi qasaekê zaf bûn ku nedihatîn hejmartin".

Pola derheq jiyana xwe ya hevpar dibêje: "Sala 1374'an(1995) li binkeya Bayincan a PDK Îranê min digel Korde Soltanî jiyana hevpar pêk anî û berhema jiyana me jî keç û kurek e".

Ebdulla Ebasî rû li xelkê Kurdistanê dike û dibêje: "Daxwazê ji xelkê Kurdistanê dikim ku yekgirtî bin û alîkarê PDK Îranê bin, jiber ku bona asûdehiya wan xebatê dike, û herweha daxwazê ji wan Kurdan dikim ku ji aliyê Komara Îslamî ve hatine xapandin ku destan ji wî karê qirêj hilgirin, hekî ne dîrok karê wan ji bîr nake".

Di dawiyê de pola dibêje: "Tenê hêviyek min heye ew ji ev e ku cardin em weke PDK Îranê vegerin Kurdistanê xwe û bi xizm û kesên xwe, û axa xwe şa bin".



Pola: "Min tucaran şer nedîtibû û nekirbû, lê bi vî halî jî min şerekî pir ji lehengî kir, piştî wî şerî nasnavê Pola, bi min hate dan".



Tundûtîjîya li hemberî jinan, karekî dijî mirovî ye

Çeko Ehmedî

Beşek zaf ji ayîn û ayînza û rêbazên siyasî û hizrî di manifêsta xwe de pirsra jinan û wekheviya di navbera herdu regezên jin û mêr de, dixin ber bas û bi awayekî digel vê pirsê berbirû dibin ku, mirov dibêje tewahiya rêbazên fiminîstî ji wan ve çavkanî digirin, lê eva ku li ser rûpelan tê nivîsandin û bangeşe jêre tê kirin, digel kiryarên wan, xwedî ferq û cudahiyek bingehîn e.

Rola herî girîng di peşveçûna jiyana mirovahiyê û berdwamî û cihgirbûna xwezayê li stûyê jinan e, û mirov dikare bêje ku jin hêma û sembola rasteqîn a man û berdwamiya mirov û perwerde û xwezayê ye, û bi dirêjahiya dîrokê jî di vê pêxemê de amadeyî cangorîtî û qurbanîdanê bûye.

Bi nehêlana tundûtîjî li dijî jinan ku weke xuya dike bi dirêjahiya dîrokê karesata han berdwam bûye, piroseyek bingehîn û qahîm dixwaze ku kultura bab û mîrsalariyê were guhertin bo ser hizra wekhevîxwaziya mirovî û bi awayekî giştî guherîn bi ser hizra her du regezên jin û meran de bîne. Mixabin cihê heyirînê ye ku di dema ku tê çavniherîkirin ku jin bo vê meremê û bi awayekî ektîv çalakiyan pêk bînin, û bi bê haydarî kultura mîrsalariyê ber bi pêşve dibin û dibin alîkarê tundûtîjîyan.

Gellek caran ev pirsyara tê holê ku gelo hewce ye ku bo gihîştina bi astê wekheviya jin û mêran, kesayetiya jin bi mêrê bê guherîn û pêgeha mêran bi jinan bihêdan, yan dibe jêhatîbûna wan berçav bê girtin, û di wan warên ku dikare bi bandor û erênî bin, bêne bi kar birin.

Mixabin beşeke berçav ji femeniştan bi bê xwendineke hûr û rastbînane û bi bê vê ku bizanin ku sivikatî bi pêgeha jinê tê kirin, hewl didin ku rast wekî xwe pêgeha mêran bidne jinan.

Ew yek jî ji hewla mîrserdestan bo parastina baladestiya heta he-



tayî ve çavkanî digre.

Di vir di ya ku cihê heyrîmanê ye ew e ku Kurdistan serbarê vê hemû paşvemaşîna ku wekî beşên din ên Rojhilata Navîn ji destan de dinalîne, bi nixandî û dane berhev ya di gel herêman û berçavgiritina rewşa siyasî, aborî, neteweyî û kulturî, em dikarin banga vê yekê bikin ku pêgeha jin li cem Kurdan ji neteweyên din bilindtir bûye, û mînak jî ji vê gotinê re gellek zor in, û yek ji wan handan û piştevaniya yekemîn serkomarê Kurd Pêşewa Qazîmihemed bo hewildana jinan derheq bidestveanîna mafên xwe û nehêlana bîra kevn ya serdestiya mêran bûye.

Em dikarin bêjin ku di nava rêberên Kurd de gellek kes hebûn ku bawerî bi mafê wekheviya jin û mêran hebûne, û di vî warî de pêngavên bihêz hilgirtine, lê bi encam gihîştina tewaya wan pê-

gavan girêdayî ye bi astê xwesta jinan, û çawanî û çendatiya çalakiyên wan bo nehêlana kultura mîrserdestiyê, û tundûtîjîya li hemberî jinan. Di dawiyê de hewce ye ku em bêjin ku bikaranîna tundûtîjîyê li dijî jinan dibe sedema lawazbûna astê perwerdehiya mirovî û encama lawazbûna perwerdehiyê jî ji rê derketina takên mirovan, yanî jin û mêran lê dikeve.

Hewildana bo binbirkirina tundûtîjîya li dijî jinan nabe em tenê bêxne stûyê jinan bixwe, belkû eva erka li ser mil mêrên rewşenbîr û azadîxwaz û wekhevîxwaz e ku di warê mirovî de piştgirî û piştevanê jinan û mafên wan ên mirovî bin.





H: Îdrîs Sitwet

Faroq Soltanî: “Em jî li gorî şiyar û îmkanatên xwe hewl didin ku asta karên xwe bilind bikin, da ku xelk ji karê me hez bike, û em bikarin bandorê li ser wan danên”.

1-Faroq Soltanî kî ye?

Berî her tiştê silavan li we pirsonekên rojnameya Agîrî dikim, û mandînebûnê dêjme we, û sipas jî bo vê seredanê ku ji bo min cihê şanaziyê ye. Ez Faroq Soltanî jidayîbûyê 15.01. 1360 (1981) û xelkê bajarê Qorwe me.

2- Çawan û kengî tu tevî cîhana hunerê bûyî û Tu tiştêk bû sedem ku tu bibî hunermend?

Her di dema zarokatiyê de ez heyranê dengê Hesên Zîrekê nemirbûm, û hînbûna lédana Defê ji aliyê xalê xwe ve bû destpêkek ji bo tevîbûna min bi karê hunerî.

3-te kengî û di çi salekê de di nav partiyê de dest bi çalakiyên hunerî kir?

Ez di bihara sala 2005'an de hatme nav refa pêşmergekê PDKÎ û piştê di koma hunerî ya PDKÎ de min dest bi karê xwe kir.

4-niha hûn çend kes li vir dişoxilin û karê ve yê jokane çawaye?

Endamên fermî ên koma mozîkê niha 4 kes in û cuda ji dema rêûresman de ku em mijûlî amadekarî û piroveyê dibin, rojên din zêdetir ez mijûlî hînbûn û piroveya li ser alavên din ên mozîkê û herwusa fêrkirina kesên xwazyarê fêrbûnê dibim.

5-çalakiyên ve ên hunerî çawan per bi pêşveçûnê diçe ?

Di rastî de hekî em li gorî birêveçûna rêûresman di navxwe ya PDKÎ de karê xwe binirxînin, heya qasekî baş e, lê li gor wan girûp û aliyên ku serbixwe kar dikin lawazî di ,karê me de heye.

6-astengên ser rêya ve çine ?

Zêdetir di warê madî de arîşe hene û herwusa kêmbûna pirsonekên şareza di karê hunerî de bandora xwe li ser karê me hebûye.

7- Çalakiyên te ên hunerî heya çi qasî di nav civakê de bandor hebûye?

Bi raya min bo vê ku karê hunerî bandora xwe hebe, divêt berde-wam di geşandin û pêşveçûnê de be. Em jî li gorî şiyar û îmkanên

xwe hewl didin ku asta karên xwe bilind bikin da ku xelk ji karê me hez bike û em bikarin bandorê li ser wan danên.

8-Tu di cîhana huneriyê de fêrî çi bûyî?

Hunera mozîkê mirov fêrî yekdilî, hezkirin û aramiyê dike, helbet hekî tu bixwe jî wusa hez bikî. Lê berevajî vê yekê tu wê bibî kesekî dilreq û xwe mezinan.

10-Pilanên te ên pêşerojê çi ne?

Pirogirama karê min di kurthey-am de fêrbûna alava Kidarnêt (Qirenî) ye ku ez mijûlim û li ser kar dikim.



Faroq Soltanî

Gotinên Pêşinan



A: Çiya Mazî

Beq nequre wê bidire:

Ku xuya mirovan çawa be mirov dê tim li pey wê xuya xwe here .Disa mirov hînî çi tiştî bibe mirov tim li pey wî tiştî ye ku bide der,ne wiha be mirovê tengezer bibe.

Dîsa ku mirov li ser tiştên ku difikire nepeyive ,mirov di hişê xwe de dihêle,ji bo vê yekê dibêjin “bera hundirê xwe dide.”

Ber siya rovî de nebe bila şêr te bixwe:

Rovî ajekî fenek e,şêr jî pir bi hêz û ajal giş jê ditirsin.

Dema ku mirov li pey yekî fenek bigere dibe ku mirov têkeve dafikan,herwiha mirov wekî wî jî xuya dibe.

Lê dema mirov li pey yekî mêr û bi hêz bigere,hêz ji mirov re çêdibe û mirovê bihêz û mêr jî tiştên xwe, eşkere dikin.Pêwistiyê jî bi fen û dafikan nabînin.Tiştên eşkere jî mirov li gor wê yekê tevîra xwe distîne.

Dîsa ev gotin tê vê wateyê ku mirov tiştêk kir bila hêja be ,ne ku mirov bi pey tiştê hûrik keve û dawiyê jî taba mirov belasebe here.

Berberî û nanê genim li cem hev nabin:

Berberî an fesadî, nanê genim jî namet û pîroz e .Jiber wê yekê jî tiştên pîroz û fesadî berberî li hev nakin .

Yan mirov wekî nanê genim paqij be yan jî mirov bi fesadî û berberiyê bi pey tiştên ne rast bikeve.

Dîsa wekî ku mirovên berberiyê dikin her tim serê wan di teşqeleyan deye.

Ji ber wê yekê jî her tim xizan û belengaz in,nanê genim ji wan re biha ye.



A: İdrîs Sitwet

Şaristana Mêhran yek ji şaristanên parêzgeha Îlamê ye ku li qerax rûbarê Gencançem hilketiye û ji aliyê bakûr tevî şaristana Îlam, ji başûr tevî şaristana Dêhloran, ji rojhelat tevî şaristana Meleşahî û ji aliyê rojava jî tevî dewleta Îraqê hevsînor e. Navê wê şaristanê yê berê Mensûrawa bûye ku di sala 1309'an(1930) de ji aliyê ferhengistana Îranê ve hat guherîn û navê wê danîn Mêhran.

Akinciyên vê şaristanê kurd in û bi zimanê kurdî dipeyvîn û piraniya xelkê vê şaristanê mijûlî cotkariyê ne û di vê deverê de bi piranî dexl (genm) diçînin.

Şaristana Mêhran di şerê navbera Îran û Îraqê de zêde zirar dît û xelkê vê deverê jî bûne goriyê siyasetên desthilatdarên dewleta Îrana Îslamê û Îraqê, û Li destpêka şerê Îran û Îraqê, şaristana Mêhran kete bin desthilata dewleta Îraqê û sala 1365'an (1986) carek din kete bin desthilata dewleta Îranê. Cihê gotinê ye ku şaristana Mêhran bi dirêjahiya 220 Kîlometran tevî dewleta Îraqê hevsînor e.

Şaristana han xwediyê pitansiyelên baş e bo geşekirina vê deverê, wek hebûna axek baş û bi mifah bo cotkariyê, hebûna rûbarên wek Gencançem û Gawî, Çengole û Gidarxoş û hebûna çavkaniyên bin erd wek petrol û gaz û hebûna gomrika ser sînor ku li ser sînorê Behramawa hilketiye ku cihek baş e bo kar û barên bazirganiyê, geşekirinek baş bi xwe dîtiye û hersal kelayên zaf wek bêton, Asin, û alavên awahiyan û tiştên xwarinê ji vê sînorê ve bo Îraqê têne şandin.

Lo gor serjimêriya sala 1390'an(2011) akinciyên şaristana Mêhran 27506 kes bûye û şaristanek xweş e, û av û hewayek xweş heye

Devera şaristana Mêhran jî wek piraniya şaristanên din



Şaristana Mêhran, Kurdistana Rojhelat

ên parêzgeha Îlamê xwediyê kevnaretiyek dûr û dirêj e û cihê şaristaniyeta mirov bûye û em dikarin îşare bi tepika kevnare Çixa ahwan û Çixa gilân bikin ku vedigere bo 7300 sal berî niha, ketîbeya Text Xan, şikewta binavûdeng ya Zînekan yan şikewta Biheşt, kelha zistanî ya walî ku li tenşt Gencançem hilketiye, ziyaretgeha Îmamzade husên, ziyaretgeha Îmamzade Elîsalih, Beq'êyê pîrçital û ...hwd.



Şaristana Mêhran di şerê navbera Îran û Îraqê de zêde zirar dît, û xelkê vê deverê jî bûne goriyê siyasetên desthilatdarên dewleta Îran û Îraqê



AGIRÎ

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 -FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Tel: (+)9647503640792

Mirov di dema xemokiyê de dest bi giriyê dike, û her bi vî awayî jî hin caran di dema kêfxweşiyê de jî rondikan dibarîne, lê niha bi awayekî zanistî eşkere bûye ku rondikên xemokiyê ji rondikên kêfxweşiyê cuda ne.

Çavên mirov di demên cur bi cur de rondiran dibarîne, hem di dema xemokiyê û hem jî di dema kêfxweşiyê de, û herwisa bi sedemên kîmyayî û xwezayî wekî: kerkirina piyazê, û gaza rondikrêj, û bi bîber (îsot) ê.

“Rose Lynn Fisher” wênegirekî pirofîşnal e, ku tekezê li ser vê dike ku gelo cureyên rondikên kêfxweşiyê, cudahî tevî hêstirên xemokiyê hene yan na?

“Rose Lynn Fisher” rondikên dema xem û kêfxweşiyê, û piyaz û ên din li bin mîkroskopê de bi awayekî zanistî vekolî, û wêneyên wê kişandin.

Di encamê de eşkere bû ku cureyên rondikên kêfxweşiyê cudahiyeke zêde tevî rondikên xem û nerehetiyê hene, serbarê vê ku herduyan jî yek çavkanî hene, û heya çawaniya giriyê jî, cureyên hrondikan diguherîne.

Di navbera rondikên xem û rondikên keyfxweşiyê de cudahî heye



Hindek tiştên Biroslî wê bikevin heracê



Di çilemîn salvegera koça dawiya ekterê navdar ê Cîhanê Biroslî de, hindek ji tiştên navbirî bi nîrxê 35 hezar dolarî, wê bêne herackirin.

Biryar e di heracê de hindek ji qomaş û herweha kirasê zer yê Biroslî ku sala 1972'an bona filma “Qomara Mirinê” kiribû ber xwe de, bê firotin.

Hewceyî basê ye ku berî tewawbûna filmê, û di temenê 32 saliyê de, Biroslî çû ser dilovaniya xwe û filma wî jî bi nivîşkanî di sînemayên cîhanê de hate ser ekranê.

Lêdana dilê wî bi çav tê dîtin



Xortekî welatê Çînê bi navê “Ho Cîlyang” ê temen 24 salî, xwediyê dilekê ye ku ew dilê wî her di zikmakî de li serveyî zikê wî hilketiye, û dilê wî di dema lêdanê de, bi ciwanî tê dîtin ku çawa lêdide.

Bi sedema vê ku %90 ji zarokên weha canê xwe ji dest didin, di dema jidayîkbûna navbirî de, ji dayîk û bavê “Ho Cîlyang” re tê gotin ku kurê we namîne, lê eva 24 sal e ku Ho Cîlyang di jiyane de maye.

Lê hewceyî basê ye ku navbirî dest ji xwendin û karkirinê hilgirt, û li pey çareseriyê ket, ku di encamê de, di nexweşxaneyê wî welatî de, nexweşiya wî hate çareserkirin.